"TKP'nin Sesi"

25. ve 26 Ocak 1986 Cum. ve P.

~~Bu yayınımızda haberlerimizden sonra ş~~

Bu yayınımızda şunları dinliyeceksiniz:

1. Nerede bir yoldaş varsa TKP oradadır programını /tümü atılımdan/

2. Kürtçe yayınımızı Ş.

---

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

25.1.86

NEREDE BİR YOLDAŞ VARSA TKP ORADADIR

Bu programımızda, TKP MK organı Atılım'ın 15 Ocak günlü sayısında, parti yaşamın sayfasında yer alan iki yazıyı sunacağız. Bunlardan ilki, "İşte örnek çalışma anlayışı" başlığını taşıyor. Andından İstanbul'dan Onur Özgür'ün "Hepinize Yürek dolusu selam getirdim" başlıklı yazısı var. Son olarak, SBKP Programı'ndan, "Uluslararası işçi ve komünist hareketinde SBKP" başlıklı yazıyı dinleyebilirsiniz.

Müzikler: A 44 ve B 37

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

K. 42.
K. 106.
K. 114.

TKP'nin Sesi
Kürtçe
Konu: 1-Kürdistan'daki öldürmelerin açıklanması; 2-Radyo dinleme grupları

Em rastiyek gelek baş dızanın.Ev Rasti ji ev e: Zordestiyên lı ser gelê Kurd bı destê devleta faşist bêzagûni têye domandın. Bı qutûta hane der mırovti lı bajarên Kurd heya iro bı sedan Kurd hatın kuştın.Rêbırınaleşgeri bona bıkarıbe gelê Tırkiyê bıxapine pêşdajot ku ev Kurd lı dıji hêzên ewlehiyê çekgırtıne, agırkırıne.Lê belê çıma ku em dızanın armanca rejima faşist çiye,me tımi eşkerekır ew derevan dıkın.Ew lawên Kurd,gundi û şıva nên Kurd dıdıne ber gullan,paşê ji agadardıkın kesê ku hatiye kuştın terorist ın.

Bûyerek ku lı hêla Bajarê Bingolê dı bajaroka Darahınê,ku jê ra Tırki dıbêjın Genç, eşkerebû gotın û ditınên me eşkerekır,ras

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

tiya wan ispatkır.Hat eşkerekırın ku Momıstayek Kurd lı qereqola cendırman berê pêşin bı rojan dı bın rênc û tedayê da hatiye gırtın,paşê ji hıldane momıstaye bıtıne dervayê gund û dane ber gullan.Rêbırına leşgeri ji dı belevoka xwe da eşkerekırye ev Kurd waxtê jı destê cendırman rewi,û gaziya leşgeran neani ci jı vi sedemê pêştaye hate kuştın.

Guhdarên hêja ev bûyer lı pêşiya çawên gelek kesan derbasbû. Gelek nas û guhdiyên Kurd kuştına Sıddık Bilgin ditın. Lê bı zordestiya qereqol û cendırman werin nekırın herin ditınên xwe eşkerebıkın.Ahaki hêzên dewleta faşist mêrkuştınek xweye dın ji jı çawan veşartın.Lê tıştık dın hebû ev planên hêzên faşist xırabkır.Ap û pızmamê Sıddık Bilgin dewlemendibûn,eşirbûn.Wan dıxwest qe nebe cendekê bıraziyê xwe hıldın bı xwe çehlbıkın.Lê

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

rêbırına leşgeri bona vi ji destûr neda.Apê Sıddık Bilgin,senatorê Kevn Mehmet Bilgin çû naz û hevalên xwe lı Enqerê dit,xebatek jir domand û axıriyê da kuştına Sıddık Bilgin hat bihistın. Bona bıkarıbın kuştına han bıheq nişanbıkın Dengbariya Şıxwılên navin ~~eşkerexyek~~ dazaninek eşkerekır û got "Sıddık Bilgin aligır rê PKK'yê ye".Xênc jı vi tu tıştek negotın.Kê,kê dıbe bıla be, kê parêzdarê kêjan ditınê dıbe bıla be,ça rêbırên welatê dıkarın kuştına wan biryarbıkın,bı gullê cendırman ~~xxxxjxx~~ bıdın kuştın,cendekê wan lı ber qereqolan çehlbıkın. Tu kes nıkare heqek ahaki der mırovti hılde ser xwe.Gere em destûr nedıne tıştek aha.Hıngê em jirbıbın,em hemû bıhevra,bı emılandına hemû keysan bıxebıtın emê bıkarıbın hemû teror,zordesti û pêkaninên dıjdemokratik yên dewletê eşkerebıkın,bıdın bihistın.Reşayiya

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

lı ser rastiyan hılgırın,rakın.Bûyera ku lı der-dora kuştına Sıddık Bilgin pêkhat rastiya han ji bı me carek dın nişankır. Hıngê mırov bê deng neminin,hıngê mırov lı dıji zordesti û terorê nehetıkın,axıriyê da dıkare kırınên rejîma faşist rokıne pêşiya ~~xxxx~~ çawê hemû gelê Tırkiyê,

Guhdarên hêja.Em tımi dıbêjın,iro careki dın ji disadıkın. Armanca rejima faşist ne ew e ku,lı bajarên Kurd lı pey ~~xxxxxx~~ kesên ku jı wanra dıbêje terorist bıreve.Armanca rejimê tırsandına gelê Kurd,pêpeskırına daxweziya azadi û wekheviyê ya gelê Kurd e. Ew qebûlnakın ku lı Tırkiyê Kurd ji dıjin.Ew rastiyek ahaki gırıng naxwezın bıbinın.Ew serê hemû kedkırên Tırk ji dışon,wana bı birbırinên şövenist dıxapinın.Paşê ji hemû lıvinên xweyên der mırovati,dı pışta "paraztına tevayiya welat" vedışê-

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

rın.Dıxebıtın karkerên Tırk lı hemberê daxweziyên netewi ya gelê Kurd derkevın.Nebın parêzdarê heqên gelê Kurd.

~~İxx~~ Em komunist,pêşverû û parêzdarê mafên gelên bındest jı bûyeran,jı çûyina dirokê dersan derdıxının.Roj bı roj ceribinên me komdıbın.Dı van geşbûnên axırin ji em dersên kêrhati derdıxının.U biranakın,gere yek mêrkuştınek cunta faşist lı Kurdıstanê veşarti nemine.Hemû kuştın û mêrkuştınê cendıman yek yek eşkerebıkın,bıdın bihistın.Ev xebat iro bona hemû Tırkiyê gelek gırıng e.Lewra ev rênc û tedayên lı ser gelê Kurd fıredıkın,lı her derê Tırkiyê beladıkın.Bûyerên Kurdıstanê dıkıne hıccet lı her derê Tırkiyê terorê dırapelikının,heq û azadiyên demokratik zêdetır dıqusinın.tevlên ku lı dest û mılên karkeran da ye dışıdının.Jı vi sedemê ye tevgera ku lı dıji zordesti û terora lı

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

ser gelê Kurd were honandın,bona peydakırına demokrasi gelek keysên fıre wê bıafırinın.De hevalno,bırano,xwişkno û şoreşger û pêşverûno; de dê,bav û pızmamê kuştiyan. Xwe lezbıkın.bılıvın ku em tev bıhevra rûyê kırêt ya rejima faşist nişanbıkın.Ber bı hırşandına rejimê gavek mehkem bavêjın.

.......

Bırayên hêja,xwişkên delal; Radyoya Dengê Partiya Komunist ya Tırkiyê dengê we Kurda ye.Gere kedkır,karker,cotkar û rewşenbirên Kurd hemû derd û kulên xwe,hemû şai û bextewariya xwe bıkarıbın dı Radyoya Dengê partiya Komunist ya Tırkiyê da bıbinın. Bê şık keysên me bê dawi ninın.Bê şık em nabêjın heya iro me weşemek heri baş pêkani.Bê şık em pesnan nadıne xwe hemû gundiyên Kurd guhdariya me dıkın.Bê şık em nabêjın dırêjayiya weşemên me yên bı zımanê Kurdi têrkır e.Bê şık em nabêjın guhdarên

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

me qasê daxweziyên me jı mera name dışinın.Bê şık em nabêjın her nameya derbasê destê me dıbe,bersıv û daxweziyên me dıde.

Bı kurti guhdarên delal,xwişk û bırayên hêja hê gelek,hım ji pır gelek kêmasiyên me hene.Em bı çawek ça lı cihanê dınhêrın ku ahaki baş,û serwaxt dıbinın kêmasiyên me hene? Armanca me,ango armanca Partiya Komunist ya Tırkiyê pêkanina şoreşa Tırkiyê ye.Jı bın barê gıran ya pêkanina şoreşa Tırkiyê rabûn,ancax peydakırına yekitiya hemû kedkırên,karkerên Tırkiyê we bıhevc e.Lı Tırkiyê Kurd ji dıjin,û pêkaninên lı dıji gelê Kurd jı kedkır û karkerên dın ferq nişandıke,gırantır û dıjwartır e. Lı vır Partiya me dızane,û wıssa qutût hıldıde,gere bona paraztına mafên Kurdan xebatek nemaze were ajotın.

Dı nav qorên partiya me da gelek hevrêyên Kurd mılên xwe dane ber mılê hevrêyên dın,bı honandi,bızaniyari tekoşinê dıdo-

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

minın.Dı bergehê,dı qorên Partiya Komunist ya Tırkiyê da honandına hemû komunistên Kurd xiretek bı sebır,û jir dıdominın.Bona bıkarıbın bı hemû welatparêzên Kurd va ji xebatek hevgırti,û hevalbendi bıdominın tevgerek bıhındi datinın.Erê em disadıkın, armanca me rızgariya axırin ya gelê Tırk û Kurd peydakırın e. Bona vi ji gere em lı ser erdên Kurdan û Tırkan mêtın û kedxweriyê dawibıkın.

Lê dı gerinên iroyin da ev pırsiyar hêzek pır pır mezın dıxweze.Dı bın zordesti û terora faşist da honandına hêzek ahaki mezın bıkeys nine.Jı vi ji pêşta bona vekırına rêya rızgariya axırin,bona jı bın va dawikırına kedxwerınê,bona gelê Kurd peydakırına azadiyek bê tuxup em mecbûrın demokrasiyê qezencbıkın.Ber vê yekêye dı rojeka me hemû şoreşger û peşverûyan da

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

xebata demokratiki fırebıkın,hemû kedkıranx hıldıne nav xebata han.Dı gerinên iroyin da lı Kurdıstana Tırkiyê xebata demokratiki ajotın ji gelek dıjwar û gıran e.

Xwişk û bırayên delal.Lı vır em dıxwezın disa werıne ser weşemên Radyoya xwe.Em dızanın kêmasiyên me hene.Lê bona domandına tevgera demokratiki radyoya me dıkare rolek pır gırıng bıleyize.Waxta em bıkarıbın lı her gundê Kurd Radyoya Dengê Partiya Komunist ya Tırkiyê xxxxxxxxx bıdın guhdarikırın,bona honandına zaniyariya demokratiki û tevgerek jir ya demokratiki gelek rê bıstinın.Hova guhdarek me lı Qızıltepê ber bı vi armancê gelek jêhati qutût hıldaye,û xebat daye destpêkırın.Ev guhdarê me,bırayê me Şerkar,lı gund bı qaydeki serwaxti lı nav gundiyan da kom û komık daye ber hev,roj bı roj weşemên me yên Tırki,û yên Kurdi guhdaridıkın,lı ser bûyer û nûçeyên Radyoyê da ci dıgrın,

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

sohbetan dıkın,pêvçûnan dıhoninın.Ahaki pêvendiyên xwe bı hemû cihanê va,lı ser bıngehek serast fıre û mehkem dıkın.Hova ev qutûta Şerkar gere bona hemû guhdarên me yên Kurd bıbe wekok,û hemû guhdarên me lı ser rêyek ahaki bımeşın.Ger guhdarên me bıkarıbın evi xebatê baş û rast pêştabıbın,wê pêvendiyên xwe bı me ra ji bıhêzbıkın,nameyên xwe zêtetır bışinın.U nameyên wan ji hıngê bıçe geş bıbe û lı ser serê cunta faşist da bıbe hetrekek gıran. Ahaki bûyerên der dora xwe emê baştır bışinıne radyoyê. Paşê emê bı guhê xwe bıbihisın û mêjiyê xwe da bıhesın,Radyo saya xebata me hemûyan dıbe dengê gelê Kurd ji,saya xiretên me ronayi û zaniyari dıbe hemû gundênKurd.

De bona gihiştına armanca hane teberık,em tev bıhevra mılên xwe bışemırinın,û dest bı xebatê bıkın.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV